# NAVEROK

**BEŞA 1 ..... 6**

XWENDEKAR ..... 6
EM BIXWÎNIN, GUHDARÎ BIKIN ..... 9
MIJARA SERBEST ..... 11
PÎVOKÊN ZOZANAN ..... 11
ALFABEYA ZIMANÊ KURDÎ ..... 12
ZIMANÊ KURDÎ ..... 14
GUHDARIKIRIN ..... 16
MAMOSTEYA HÊJA ..... 18
NASANDIN ..... 20
NIVÎSANDINA TÎPÊN BIÇÛK ..... 22
TOPA MIN ..... 24
MIJARA SERBEST ..... 28
DEMSAL ..... 28
XEWA LI BIN KULAVÊ SPÎ ..... 29
DAXWAZA AXAFTINA BI PIRTÛKÊ RE ..... 32
TEST 1 ..... 34

**BEŞA 2 ..... 35**

SERPÊHATIYA PIRTÛKÊ ..... 35
BEHLÛL Û DEH KER ..... 37
MIJARA SERBEST ..... 39
EY FELEK ..... 39
GUR Û ROVÎ ..... 40
GOREYA ZINAR ..... 42
MORÎ Û ÇIRÇIRK ..... 45
ŞÊR Û MIŞK ..... 47
LÎSTOK ..... 49
NAMEYA ÇÎÇEKÊ ..... 50
HÊZ DI YEKÎTIYÊ DE YE ..... 53
EM BI BERFÊ DILÎZIN ..... 55
TEST 2 ..... 58

**BEŞA 3 ..... 59**

MAMIK ..... 59
AX KOBANÊ ..... 61
HINDO Û RINDO ..... 63
XAÇEPIRS 1 ..... 65
NEXWEŞIYA DAYÎKÊ ..... 66
MIJARA SERBEST ..... 68
CEJNA 8'Ê ADARÊ ..... 68
HÊLÎNA PAQIJ ..... 70
ADAR E ..... 72
NEWROZ Û ZAROK ..... 74
ROJBÛNA HERJÎNÊ ..... 76
PÊKENOK ..... 79
XEZAL Û MASÎ ..... 80
GURÊ NALBEND ..... 81

# DAXWAZA AXAFTINA BI PIRTÛKÊ RE



Dîcleya biçûk sibê zû ji xewê rabû. Pirtûka xwendinê ya birayê xwe Firat bi destê xwe hilgirt û pelên wê wergerandin. Li wêneyên pirtûkê nêrî, xwest bixwîne. Lê nekarî bixwîne. Ew hêj pênc salî bû. Gelek çîrok ji dapîra xwe guhdarî kiribûn. Dapîra wê gotibû, ev di pirtûkan de nivîsandî ne. Ji ber wê çendê Dîcleyê got:

- Pirtûka ciwan, pirtûka biçûk, çîroka "Dîk û Rovî" ji min re bibêje. Lê pirtûk bêdeng ma.

Dîcleyê ji dayîka xwe pirsî:

- Dayê, ji bo gotina çîrokan, ez ji pirtûka birayê xwe hêvî dikim, ew bêdeng dimîne. Gelo, ew ji min xeyidiye?

- Na keça min, pirtûk naxeyide.

- Wê kengî bi min re biaxive?

- Wê niha biaxive keça min.

Dayîka wê, pirtûka xwendinê ya Firat ji ser mêzê rakir û dest bi xwendina çîroka "Dîk û Rovî" kir.

Dema Dîcleyê li çîrokê guhdarî dikir, di hembêza dayîka xwe de niviva.




# TEST 1



**1- Hêmaya xal li kû derê tê bikaranîn?**

**a-** Li dawiya peyvê.
**b-** Li dawiya hevoka pirsyarî.
**c-** Li dawiya hevokê.



**2- Çend tîpên zimanê kurdî hene?**

**a-** 30
**b-** 31
**c-** 32

**3- Vebijêrkên li jêr, a rast (r) û ya çewt (ç) binivîsin:**

**a-**Jimara tîpên dengdêr di zimanê Kurdî de heşt in (…)
**b-**Tîpa destpêka navên taybet biçûk tê nivîsîn (…)
**c-**Wateya peyva çerx, sedsal e (…)

**4-Valehiyên li jêr li gorî helbesta "Topa min" dagirin:**

- Topa min ….. … rengî
- … ….. û rep û dengî

## Wateya Peyvan

**Şivik:** Darikên zirav û dirêj
**Deste:**Qevdik, gurzik, baq
**Hewldan:**Kar, xebat û tevger

## Em Têbigihin

**1-** Bûyer di navbera kê de derbas dibe?
**2-** Cotkar, dixwest zarokên wî li hember hev çawa bin?
**3-** Cotkar, çawa zarokên xwe ezmûn kirin?
**4-** Bûyerê zindî bikin?

## Destûrên Ziman

Li hevoka jêr binêrin, bixwînin, fêr bibin ka bêhnok li ku derê tê danîn. Hevokê li lênûsa xwe binivîsin.

*Cotkarî got: Ji hev hez bikin, alîkariya hev bikin.*



## Wateya Peyvan

**Temen:** Jî,

## Em Têbigihin

**1**-Dema Hindo û Rindo rastî hev tên, çawa silav didin hevdu?

**2**-Hindo, ji ber çi diçû dibistanê?

**3**-Hindo ji bo çûyîna dibistanê, çi bersiv da Rindo?

## HÎNDARÎ

**Nivîsîna li jêr bi awayekî rast û xweşik li lênûsa xwe binivîsin.**

Adar xemla Biharê ye.
Xemla çiya, dewlemendiya welat e
Çiyayê Agirî bilindtirîn çiyayê Kurdistanê ye.

## Destûrên Ziman

**1-** Navên di mijarê de Rindo, Hindo û Viyan her yek ji wan navên taybet in.
Ew di nava hevokê de bi tîpên çawa hatine nivîsandin?

**2-** Li dawiya hevokên li jêr, hêmaya pêwîst bi kar bînin.
Tu çawa yî, baş î….
Tu bi kû ve diçî….
Ez naçim aş, diçim dibistanê…

# HÊLÎNA PAQIJ



Hêlîn keçeke jêhatî û paqij e. Di malbateke paqij de dijî. Hêlîn sibê zû radibe, ser û çavên xwe dişo. Laşê xwe jî paqij dike. Dema ku di kolanan de dimeşe, gelaşên dibîne dixe gelaşdankê de, ji ber ku paqijî nirxek ji çanda mirovan e.

Mamosteyên wê jê xweş in, ji ber ku hevalên xwe jî fêrî paqijiyê dike û ji wan re dibêje: paqijî şaristani ye. Paqijî ji tendirostiya mirov re pêwist e. Ji ber vê yekê Hêlîn jiyanekî serkeftî diji. Ji boy wê paqijî di jiyana wê de xala herî giring e. Bi vê sedemê Hêlîna pak cihekî xwe yê taybet di nav hevalên xwe de çêkiriye.

## Wateya Peyvan

**Laş:** Gewde, beden
**Gelaşdank:** Selika gelaş dixinê
**Pak**: Paqij,xawen

## Em Têbigihin

**1-**Hêlîn keçeke çawa ye?
**2-**Ji ber çi pêwîste mirov xwe paqij bike?

## Destûrên Ziman

**1-** Peyvên li jêr rast bixwînin û binivîsin.
*“Gelaşdank, kolan,paqijî”*
**2-** *“Hêlîn sibe zû radibe ser û çavên xwe dişo.”* Vê hevokê kite bikin û li lênûsa xwe binivîsin.

## HÎNDARÎ

Di vê mirov çawa xwe ji qirêjiyan bi parêze, bi çend hevokan di refa xwe de ji hevalên xwe re bi bêjin.

# DARA HINARÊ





Di nava dehlekê de, dareke hinar hebû. Di qurmê darê de, koremişk û kurmikên axê dijiyan. Li ser gewdeyê wê morî û kêzik hebûn. Li ser çiqilên bilind jî mêş vediniştin.

Rojekê dara hinarê wiha got:


-Mêvanên hêja! Ka bibêjin hûn ê heya kengî di mala min de bimînin? Hûn tiştekî xwe jî nadin min?

Koremişk jê re got:

- Ma tu dizanî? Xebata me sûdê dide te jî. Şev û roj em ber rehên te dikolin. Bi vî awayî tu hêj zêdetir rehên xwe ber didî nava axê. Lewra tu jî geş dibî. Mêşan jî wiha dest bi gotinê kir:

- Heke awazên me yên xweş tunebûna, wê di giyanê te de tengezarî çêbûya. Em bi awazên xwe, te pir şad dikin.

Bi vî rengî dara hinarê, zanî ku mêvanên wê sûdê didinê. Careke din ev gazind ji zindiyên derdora xwe nekir.


KURDISTAN
Caspian Sea
Gola Hezar
Rusya
Azerbeycan
Gurcistan
Ermenistan
Iran
Deryaya Reş
Turkiye
Surye
Deryaya Sipî
Iraq
Erdexan
Qers
Agirî
Bayazîd
Maku
Wan
Ûrmiyê
Çolemerg
Mehabad
Seqiz
Sine
Kirmaşan
Îlam
Qesrî Şirîn
Silêmanî
Mendelî
Kerkûk
Hewlêr
Mûsil
Duhok
Şirnax
Sêrt
Bidlîs
Mûş
Erzorom
Çewlik
Êlih
Mêrdîn
Amed
Qamişlo
Erzingan
Dersîm
Xarpût
Rîha
Hesekê
Meletî
Semsûr
Dîlok
Sewas
Mereş
Efrîn
Km. 0 100 150
Miles 0 50 100